


Çekên Komkuj û Bandora Wan



Di 15 û 16ê Nîsan a 1987 de balefirên şer yê Iraqê bombeyên gaza jehrê li ser gundên Kurdî li geliyên Cafatî û Balîsan li Bakûrê Iraqê berda. Ev yekem car bû di dîrokê de ku dewlet çekên kîmyawî li dijî xelkên xwe yê sivîl de bi kar bîne.

Piştî, Serokê Îraqê Sedam Hisên bi rotînî fermana bikaranîna çekên komkuj li dijî Kurdan derxist. Xirabtirîn bikaranîna çekên kîmyawî ew bû ku di 16ê Adar a 1988 li bajarê Kurd Helebce ku dikeve nêzîkî sînorê Îranê/Iraqê de berda. Hêzên Esmanî Iraqê bombên gaza Xerdelê û Sarîn û Tabun li ser Helebce weşand. Di vê rudawê de derdora 5,000 Kurdan kuştin û bêtir ji 10,000 birîndar bûn.

Ev Melzemeya Mamoste wekî rêberek ji 2 belgefilmên ku vekolîn li ser bandora dirêj ya çekên kîmyawî li ser rûniştvanên Helebceyê xizmetê dike.

Yekem fîlm, **"Îfadeyên Şahidên Êrîşa Kîmyawî li Dijî Helebce 1988"** dîmenên arşîvî nîşan dide ku di dema êrîşa li dijî Helebceyê de hatine girtin li gel şîroveyeke ji gundiyan ku rizgar bûne. Têmaşevan divê bîn agahdarkirin ku di nav fîlm de hinek dîmenên trajîk hene ku bandora êrîşa çekên kîmyawî nîşan dide.

Duyemîn fîlm, **"Zarokên Helebce Yê Windayî: Çîroka Zimnako"**, çîroka zarokê bi navê Zimnako Mihemed Ehmed dibêje. Ew flitî ji êrîşê li ser Helebce, di heman demê de ji malbata xwe cuda bû û li Îranê malbatek din ew bixwedî kirin. Niha Zimnako gence û vegeyriyê Helebce ku ew û diya xwe ya rasteqîne piştî 21 sal li hevdû vegeyriyan.

Ne girînge her çar beş di vê Melzema Mamoste de bi temamî bê gotin ji xwendinkaran re. Li şûna wê, ew wek çavkaniyekê tê bikaranîn ji bo perwerdekar armancên fêrbûnê ji nav helbijêre, li pey ve pirs û çalakiyan ku herî baş ji bo bersîvkirina pêwîstiyên xwendekarên xwe wê hilbijêrî. **Agahî ji bo xwendekarên 16 salî û mezintir hatine dîzaynkirin.**



Beşê 1

Kîmyabarana Bajarê Helebce

'Tê bîra min gaz wek baranê dibarî. Çavên min sor û tije xwîn bûn,
û li derdora xwe mîna balindeyek birîndar ez diçûm û dihatim .. Ew
gaz wisa xurt bû ku jiyana min her û her wêran kir'

– Ardalan Anwar Qadir

Serinc a wanê:

- Destpêkek li ser nasandina şerê Îran-Iraqê
- Naskirina ciyawazî di navbera leşker, pêşmerge û welatîyên sivil de
- Fikirkirin li ser bikaranîna çekên kîmyawî di dema şer de

Armancên fêrbûnê:

- Ji bo têgihiştina çima welatîyên Kurd bûn armanc di dema şerê di navbera Iraq û Îranê di sala 1980an de
- Ji bo fêmkirina çima Sedam Hisên çekên kîmyawî û herweha çekên dinên şer bikaranîn

Wane:

Bêje xwendekaran ku ewê anha temaşey du belgefilman bikin derbarê êrîşa çekên kîmyawî li ser bajarê Helebce li Kurdistana Iraqê di 16ê Adarê 1988. Xwendekaran hişyar bike ku yek ji herdû belgefilman hinek wêneyên gelekî grafîk nîşan dide, di nav de dîmenên birînin mezin û komkujî.

Herdû filmên **"Îfadeyên Şahidên Êrîşa Kîmyawî li Dijî Helebce 1988"** û "Zarokên Helebce Yên Windayî: Çîroka Zimnako" nîşan bide.

Nîqaş bikin ka çima rejîma Iraqê ya Sedam Hisên amade bû ku dest bibe tedbîrên wisa ekstrîm ji bo bi dawîkirina berxwedana Kurdan ku li dijî desthilatdariya wî rawestiyabûn. Behsa nimûneyên dîrokî bike bê çawa Iraq, Îran û Tirkîye hêzên leşkerî bikaranîn ji bo serkutkan serhildanên Kurdan, û behsa ew tiştên ku Kurdan xwestin û hê jî dixwazin bighêjin bikin.

Êrîşa li dijî Helebce di çarçoveya dîrokê de ji bo xwendekarên şirove bike:

- **Şerê di navbera Iraq û Îranê de ji 1980 heta 1988.** Ew şer di serî de dest pê kir bi hewldana rejîma Iraqê ku hinek xak ji Îranê veqetîne ku di sala 1975 ji bo milkiyeta Îranê pênasîn kiribû li ser sînorê başûrê herdû welatan de. Iraq ev taawîzên herêmî kiribû ku piştgiriya Îranê ji bo serhildana Kurdên Iraqê li dijî Bexdayê rawestîne li gorî peymanê bi Îranê re tê naskirin wek Peymana Cezayîrê.

- ♦ **Sedam Hisên motîvasyona din hebû ji bo çûna şer bi Îranê re di 1980 de.** Ew hest bi gef dikir ji Şoreşa Îslamî ya Îranê sala 1979 û dixwest kar bike ji bo rûxandina rejîma nû ya Ayetullah Xumeynî, berî ew li beramber wî bisekine. Bi gotineke din, ew lêxistineke pêşîgir bû.
- ♦ **Di qonaxa dawî ya şerê Îran-Iraqê de Îranê hêzên Iraqê ji Helebce derxistin bi piştgiriya pêşmergeyan.** Iraqî ji bo tolhildanê êrîşî bajar kirin bi gaza jehrê di 16ê Adarê 1988de. Nêzîkî 5,000 kesên sivîl yê Kurd di êrîşê de jiyana xwe ji dest dan, û zêdetirî 10,000 birîndar bûn. Gelek ji kesên fililîn bi nexweşiyên giran ketin piştî wextek dirêj ji destpêka kîmyabaranê de, û heta îro gelek hê jî di bin bandora nexweşiyê de ne.
- ♦ **Hikûmeta Sedam Hisên yasayên navneteweyî bînpêkirin dema ku artêşa Iraqê gaz bi ser Helebce de berda, çunkî bikaranîna gaza jehrê qedexe ye li gorî Peymanên Cînêv.** Lê belê ev ne cara yekê bû Iraq çekên kîmyawî li dijî sivîlan bikaranîbû. Yanzdeh meh berê, hêzên Iraqê gaza jehrê di geliyên Cafatî û Balîsan li bakurê Helebce bikaranîbû. Êrîşa çekên kîmyawî tolhildan bû ji bo piştgiriya gundiyên Kurd ji Pêşmerge re û her ji bo hevkarîya serokatiya Kurd ku bi hêzên Îranê re li dijî artêşa Iraqê bûn. Rejîma Sedam berdewam bû di bikaranîna çekên kîmyawî qedexekirî li Kurdistanê heta dawîya Tebaxa 1988.

Pirsên şopandinê:

- ♦ Çend kes di êrîşa li dijî Helebceyê hatin kuştin?
- ♦ Çend kes jî birîndar bûn?

Çalaki:

- ♦ Bila xwendekar çavên xwe li pênase yê 'leşker', 'pêşmergeyan' û 'sivîl' bigerînin. Nîqaş li ser rolên her yek ji van bike: leşker, pêşmerge û welatîyên Kurd ên ku li nav gundan jiyana dikin di dema şer de.
- ♦ Bila xwendekaran nîqaş bikin çima ew bawer dikin Sedam Hisên gaz berda li ser xelkên sivîl yê Helebceyê. Armanca kuştina welatîyên sivîl li çûna leşkeran de çi bû? Çi bandor dibe vê yekê li ser gelê Kurd hebû? Çi bandora vê yekê li ser encama şer de hebû?
- ♦ Gelo ji mafê milletekî ye biryar bide ka çi welatek ew dixwazin wan birêveberin. Li ser vê gotûbêj bikin. Destûrê bide xwendekaran ji bo sedemên xwe eşkere bikin.
- ♦ Bila xwendekaran nîqaş li ser giringiya qîmeta welat beramber giringiya qîmeta kesên ku li ser wê erda welat jiyana dikin. Dibe ev yek giring be ji bo rêberên siyasî? Çima an çima ne?





Beşê 2

Çekên Kîmyawî Çi Ne?

'Min bîhna çermê xwe dikir ku wek bîhna sosîsên şewitandî bû. Serê min werimî bû û rûyê min reş bibû. Ez dikuxiyam û çavên min xwîn kirin'

– Bêxal Elî Hemebor

Serinc a wanê:

- Destpêkek li ser çekên kîmyawî
- Fêmkirina bandorên fîzyolojîk yên yekser ên çekên kîmyawî

Armancên fêrbûnê:

- Ji bo fêrbûna ka çekên kîmyawî çi ne û çawa ew belav kirin
- Ji bo têgihîştina çawa çekên kîmyawî cuda ne ji çekên şewitandinê, teqemenî, û çekên gule avêj
- Ji bo fêmkirina bandora yekser ên çekên kîmyawî li ser bedena mirovan
- Ji bo lêkolînkirina yasayên navnetewî - di vê rewşê de Peymana Cinêv - derbarê bikaranîna çekên kîmyawî yên di şer de û li dijî sivîlan
- Ji bo nîqaşkirina helwesta civata navnetewî ya ji bo bikaranîna Iraqê çekên kîmyawî li dijî Kurdan

Wane:

Ev beş bi taybetî li gel filmê **"Îfadeyên Şahidên Êrişa Kîmyayî li Dijî Helebce 1988"** hatiye danîn.

Berî ku hun dest bi dersê bikin, li piştta vê rêbera perwerdeyî binerin. Rûpela ku bi sernavê **"Bandora Madeyên Kîmyawî li ser Bedenê Mirovan"** bibînin. Kopyan ji vê rûpela agahdariyan çêke an jî li ser projêkter vêxe da xwendekar bikarbin dersê bişopînin.

Xwendekaran hişyar bike ku film hinek wêneyên gelekî grafîk nîşan dide, di nav de dîmenên birînin mezin û komkujî. Fîlm bi tenê nîşan bide an jî li gel filmê **"Zarokên Helebce Yên Windayî: Çîroka Zimnako"**

Piştî dîtina herdû belgefilman rûpela agahdariyan bixwîne u pirsên şopandinê û çalakîyan bikarbîne ta ku xwendekar têbighe li ser bandorên çekên kîmyawî.

Ji xwendekaran re şîrove bike ku çekên kîmyawî madeyên gelekî bijehr di nav de hene ku tîn bikaranîn ji bo zirarê mirovan an ji kuştina wan. Bi alîkariya rûpela agahdariyan ji xwendekaran re cudayiya gazên kîmyawî ku li ser gundiyên hatine bikaranîn şîrove bike. Piştê li ser tesîrên van çekên kîmyawî li ser bedena mirovan biaxive.

Pirsên şopandinê:

- ♦ Kîjan jehrên kîmyawî di êrîşa li ser Helebce de hatin bikaranîn?
- ♦ Çawa çekên kîmyawî hatin weşandin?
- ♦ Di çi demê de ji rojê êrîş dest pê kir? Çi dema salê bû?
- ♦ Berî ku artêşa Iraqê çekên kîmyawî bikaranîn, çi cor bombeyên din bikaranîbû?
- ♦ Çi bi serê gundiyên ku di jêzemîn de xwe veşartbûn hat?

Çalaki:

- ♦ Bi alîkariya rûpela agahdariyan nîqaşa cudayiya madeyên kîmyawî bikin ku di êrîşa li ser Helebce de bikar hatibûn û çawa ew madeyên kîmyawî belav bûn. Çi bandorên dem kurt her yek ji wan madeyên kîmyawî hiştin li ser qurbanîyan? Bandorên demdirêj çi bûn?
- ♦ Bila xwendekar nîqaş bikin ka çima ew bawer dikin hêzên Sedam Hisên zêdetir ji yek madeyên kîmyawî bi kar aniyê. Çi bandor vê li ser rûniştîyên Helebceyê hişt?
- ♦ Ji bo vê çalakiyê seetek ji bo eyara wext divê. Hejmareke di navbera yek û çar de bide her xwendekarakî. Hejmara li gor xwendekaranên ku beşdarbûn bide. Ew girtebêja jor bixwîne derbarê heval û hezkiriyên mirov - 'Tu wan dibînî ku ew birêve diçûn û diketin mîna pelên dara li erdê' -Bêje xwendekaran bisekinin li ser piya û hatûçûn di nav odeyê de bikin, bila destên xwe bidin xwendekarên ku di ber wan re derbas bibe (wek tewqe silav). Piştî yek deqîqe, bêje her kesî helgirê hejmara 'yek' li ser erdê rakeve. Piştî deqeyek din, bêje her kesî helgirê hejmara 'du' li ser erdê rakeve. Piştî deqeyek din bêje her kesî helgirê hejmara 'sê' li ser erdê rakeve. Destûrê bide hemû xwendekarên mayî bi rêve li dora wan hatûçûn bikin ta yek deqîqe. Ji xwendekaran bixwaze veşerî kursiyên xwe. Bila xwendekar piştî beşdarbûn di vê çalakiyê de fikr û ramanên xwe nîqaş bikin.
- ♦ Bila xwendekar çavên xwe li pênasê yên çekên şewitandinê yên wekî Napalm, çekên teqemenî yên wek bombên çandî, û çekên gule avê yên wekî guleyên bigerînin. Bêje xwendekaran mûqayesekirin di navbera ev cureyên çekan bi çekên kîmyawî re bikin. Daxwaz ji xwendekaran bike nîqaş di nav koman de bikin li ser bandorên yekser û di demdirêj ji her curek ji van çekan re. Nîqaş bikin ka kîjan cureyên çekan bizirartire. Destûrê bide xwendekaran ji bo şîrovekirina sedemên xwe.



Beşê 3

Bandorên Demdirêj Yên Çekên Kîmyawî Li Ser Xelkên Helebce

'Me rêjeyên bilind ji kurtbûna henase dît ji ber pişkên qurbanîyan ji kar ketibûn, herwisa hinek astengî di dîtîna de wek şewitandina çav û gelek nexweşiyên demara. A ecêb ew bû ku di du rojan de dora 500 nexweşî belav bûn ku berê tine bûn di nav nifûsa 40,000 kesî de'

– Dr Fûad Baban, xelkê Silêmaniye û li Helebce mezan bûye. Di sala 1998 de axivî

Serinc a wanê:

- Fêmkirina bandora fîzyolojîk a demdirêj yê çekên kîmyawî
- Fêmkirina bandora derûnî a demdirêj yê ku çekên kîmyawî li ser rûniştîyên Helebce hiştin
- Fêmkirina encamên êrîşa li ser Helebce

Armancên fêrbûnê:

- Ji bo fêrbûna bandora wêranker ya şerê kîmyawî li ser biyolojiyê nivzên mirovan
- Ji bo naskirina ku çawa çekên kîmyawî bandor li ser malbatên Helebeceyan kirine
- Ji bo naskirina awayên traumaya derûnî ku qurbanîyên Helebce dîtî
- Ji bo fikirkirina ka çawa mirov hest dike gava şahid be li ser van curên kuştin û birîndarbûn bi çekên kîmyawî
- Ji bo nîqaşkirina bandora êrîşa çekên kîmyawî li ser malbatan

Wane:

Ev beş xwendekaran han dide ku fikir bikin li ser bandora êrîşa çekên kîmyawî ku piştî demeke dirêj dimîne.

Piştî dîtina herdû belgefilmên **"Îfadeyên Şahidên Êrîşa Kîmyawî li Dijî Helebce 1988"** û **"Zarokên Helebce Yê Windayî: Çiroka Zimnako"** pirsên şopandinê bersiv bidin û çalakîyan bikin ta ku xwendekar têbighe li bandorên çekên kîmyawî

Rûpela agadariyan **"Bandora Madeyên Kîmyawî li ser Bedenê Mirovan"** belav bike an jî bi projêkter nişan bide ta ku alîkariya xwendekaran bike di bersivdana pirsên derbarî bandora çekên kîmyawî.

Pirsên şopandinê:

- Çi qewimî bi ser welatîyên bajarê Helebceyê di dema êrîşê de? Û piştî êrîşê?
- Çiqas zarok wînda bûn piştî êrîşê?
- Çi qewimî bi ser malbata Kurd ya Zimnako? Kî mir? Çend kes flitîn ji êrîşê? Çend kes hê windayî ne?
- Çawa Zimnako diya xwe ya rasteqîne nas kir?

Çalakî:

- Bi bikaranîna rûpelê agahdariyê, li ser bandorên demdirêj yê çekên kîmyawî li ser bedenê mirovan: şêrpence, nezokî, kêmasiyên zikmakî, korbûn, nexweşî bihindan, guherandinên cenetîk û traumayên psîkolojîk. Bi peyive gelo divê çekên kîmyawî li gor encama van bandoran bîn qedexekirin.
- Bi bikaranîna rûpelê agahdariyê, li gel xwendekaran bi peyivîn li ser bandora demdirêjî cenetîkê ku çekên kîmyawî li ser bedenê mirovan dihêle. Bila xwendekaran nîqaş bikin ka ew bawer dikin ku bi qestî artêşa Iraqê ev êrîş kir. Eger wisa be, çima? Çi bandora van çekan li ser gelê Kurd de wek milletekî heye? Çi bandora vê yekê li ser daxwaza Kurd ji bo bidestxistina serxwebûnê heye?
- Ji xwendekaran bipirse bila bifkin dê çawa hest bikin eger nizanibin ku endamên malbata wan zindî an mirî ne. Li gel xwendekaran gotûbêj bike eger baştire ji bo dê û bavên ku bizanibin zarokên wan bi saxî mane yan mirine, an ji baştire ku çarenûsa wan nas nekin. Ji xwendekarên daxwaz bike sedemên xwe gotûbêj bikin.





Beşê 4

Adetkirin Li Gel Trauma

'Hestekî gelek seyre ku navê te li ser hosiya gorê hebe
berî ku tu bimire'

– Zimnako Mihemed

Serinc a wanê:

- Fikir kirin li ser bandorên traumatîk ya êrîşa li ser Helebce
- Behsa awayên bandora êrîşê li ser malbatan
- Li berçavgirtina ku huner û perwerde dikarin alîkarîya qurbanîyên cênosaydê bikin heya qurbanî aştiyê bibînin

Armancên fêrbûnê:

- Ji bo ku li ser tecrûbeya Zimnako Mihemed Ehmed bisekinin
- Ji bo bifikirin ka wê çawa hest bikin eger yek ji wan zarokên wînda yê Helebceyê bûna
- Ji bo bifikirin ka wê çawa hest bikin eger yek ji wan dê û bavên zarokên wînda yê Helebceyê bûna
- Ji bo fêhm bikin ku encamên êrîşa li ser Helebce heya îro jî hîn xuyane
- Ji bo nîqaşkirina çima bibîranîna û gotûbêjkirina bûyerên trajîk girînge

Wane:

Ev ders bi taybetî tê fêrkirin li gel filmê **"Zarokên Helebce Yê Windayî: Çiroka Zimnako"**

Piştî dîtina yek an jî herdû filman pirsên şopandin û çalakiyan bi kar bînin ji bo nîqaşkirina ka çawa xelk adet dikin li ser jiyan li gel biserhatiyên trajîk. Xwendekaran han bide ku xwe bixin cihê Zimnako Mihemed Ehmed û rizgarbûyên dinê êrîşa li ser Helebce de.

Pirsên şopandinê:

- Zimnako çend salî bû gava wî diya xwe ya rasteqîne nas kir?
- Çi astengî di rêya wî de çêbûn di encama êrîşê de? Çiqasi dirêj bûn?
- Kê Zimnako bixwedî kir piştî ku ew rizgar bû?
- Çi bi serê dê û birayên wî yên Îranî hat?
- Zimnako çawa hest kir dema ku naskir ku endamên malbata wî biyolojîk ji êrîşê s ax filitîne?

Çalakî:

- Ji xwendekarên xwe bipirse, ka ew bawer dikin ku gelek zarokên din rizgar bûne ji êrîşê ji bilî yên ku hatin dîtîn.
- Ji xwendekaran bipirse diya Zimnako ya Îranî çî nav li wî kiribû. Ji wan bipirse temenê wî çend salî bû gava wî navê xwe yê Kurdî rast nas kir. Bila xwendekar bandora hebûna du navên cuda û du nasnameyên cuda ji yek mirovî re nîqaş bikin. Çawa dê xwendekar hest bike eger ew nas bike ku navekî wî din û malbateke din hebû?
- Vê rastiyê gotûbêj bikin ku gelek ji wan zarokên windayî dibe ku ji aliyê dê û bavên din ve hatine mezinkirin, û dibe ku heya ana ew nizanin ku ew rizgarbûyên êrîşa li dijî Helebce ne. Ji xwendekarên xwe bipirse ka ew dê çêtir be ku hemû zarokên mayî jî derbarê êrîşê û çarenûsa malbatên xwe nas bikin, yan jî, wê baştir be ku jiyana xwe wek berê berdewam bikin bêyî ku vê rastiyê nas bikin? Ratsî zirarê dighine kê û ji kê re alîkare?
- Ji xwendekaran bipirse ku bifikirin di wan peykerên ku dîtin di filmê **"Zarokên Helebce Yên Windayî: Çîroka Zimnako"** de ku ji bo bîranîna êrîşa li dijî Helebceyê ne. Ew peyker çî temsîl dikin? Çima ew hatin afirandin? Bila xwendekaran nîqaş bikin ka çawa rizgarbûyên êrîşê hest dikin dema li peykeran dinerin. Nîqaş bikin gelo bîranîn başe yan jî baştir ku mirov wan bûyerên xemgîniyê jibîr bibe.



Rûpela Agadariyan

Bandora Madeyên Kîmyawî Li Ser Bedenê Mirovan

Rastî


Artêşa Iraqê gaza xerdelê û gaza damaran bikaranîn wek karmendên damaran Sarîn û Tabun li hemberî gelê Helebceyê.

Gaza xerdelê dibe sedema korbûnê û durustbûna nepoxên bi êş li ser çerm. Cihên herî xirab ku bandor li ser dîke binçeng e û sîvok in (perçe laşê mirov di navbera zik û rihin de). Ger hilmê bike ziyanên mezin dighîne pişka mirov.

Nîşanên gaza xerdelê dibe piştî 48 saetan xuya bikin.

Çav

- Korbûn
- İltîhab
- Hesiyyet
- Sorbûn
- Şewat



Çerm

- Nepoxên êşê
- Xurîn
- Sorbûn

Rastî

Mirov çiqas zêdetir hilma gaza xerdelê bike zîrarên mezintir li ser bedenê wî dê bihêle - û îhtîmaleke kêmtir ku ew beden bi temamî qenc bibe ji berketina çekên kîmyawî.

Ji bilî vê, gaza xerdelê dikare zîrarê bîghîne DNA ya laş, tê wateya ku zîrar bîghê nîfşên paşerojê.

Sîstema bêhngirtinê

- Çilmbûn yan bixwînbûna bêvil
- Pijmîn
- Zuhabûna qirrikê
- Kurtbûna bêhnê
- Kuxik
- Êşa bêrikên bêvilê



Sîstema hezimkirinê

- Êşa zik
- Zikçûn
- Ta
- Dilxelandin
- Verşandin

Rastî

Tabun madeyeke avikî bêreng e, bêhnek sivik a fêkî yan jî behîv jê tê dema ku di forma xwe ya nepak de be. Ev madeya demaran ji bedenê mirovan re gelek jehirkirî ye dema ku mirov hilmê bike yan jî, bi riya çav û çerm bighê laş.

Sarin madeyek hevgerî fosforîye ku zerarê dighîne sîstema rehikan di laş de.

Ev gaz dikare mirov di nava 10 deqeyan bikuje.

Çav


– Tengbûna gilêna çav
– Çavên bi hêsir

Dev

– Girêz

Bêvil

– Çilm herikandin



Gedek

– Verşandin

Pişk

– Fetisandin

Gedek

– Verşandin

Sîstema rehikan

– Kêmkirina karên demara

Nîşaneyên din

– Teşenicên xurt

– Ji destandana kontrol li ser karên laş